# Du patolên befrê
çîrok

Nivîsîna: Hîwa Qadir
Wergerandin ji kurmanciya jêrî: Xelîl Duhokî

Êvarekê, pir befir ji asmanî dibarîya. Du patolên befirê li tenîşta hev, digel yên din dihatin xwarê. Yek ji wan xemgîn xûya bû û ya dî jî dilxoş û devbken bû.
Patola dilxoş, ji ya xemgîn re got:
Ey patola spî û ciwan, tu ji bo çi wesa xemgînî?
Patola xemgîn got:
Ez hizra wî welatî dikim yê ku jê hatîm.
Tu ji kî derê hatîy?
Ez ji welatekê dûr hatîme ku navê wî Kurdistan e.
Befira dilxoş got:
Dîyar e ta ku gehiştî ye vêre, tu gelek wesitîyayî.
Patolebefira xemgîn got:
Ne, ez ne ji rê wesitîyame, belku ez hizirê di hindê de dikim ku ev kîjan welate ku em bi ser de dibarîn.
Patola dilxoş got:
Ez dizanim ev kîjan cihe, çinku ez li vê deverê dijîm, ev der welatê swêdê ye. Hêşta pir maye ku em bigehîne erdî. Ma ez dişêm bipirsim, ka tu çawa hatî ye vê derê?
Patolebefira xemgîn got:
Dema ku hêşta ez av bûm û ne bûbûm hilim, rojekê bireke (komeke) masîyên kesk û sor, di wî rûbarê ez tê de dijîyam, leyîztkên xohlavêtinê dikirin. Xo ji avê bilind dikirin û dîsan diçûne kûratîya rûbarî. Masî jidil dikenîn û bi lez di nav avê de dihatin û diçûn. Carekê ji nişka ve, ez ketime ber kurîya masîyekê û digel çend dilopên dî yên avê avêtme ser kevirekî bi rex rûbarî ve .Lê tava rojê ya germ li min da û ez kirme hilim. Evca, ez jî ber bi asmanî ve firîm. Ji bilindahyê min temaşayî çîyayên bilind û rûbarên kesk dikir. Dilê min xoş bû, çinku ez bi azadî difirîm û min dişîya wan cihan bibînim yên ku berê min ji bilindahîyê nedîtibûn. Îcar ez li wê derê, li asmanê Kurdistanê yê şîn têkelî ewrên spî bûm. Ewran li asmanî, rengên cur bi cur dirust dikirin. Hindek ji ewran, xo dikir kêvirîşik û hindekên dî jî xo dikir nêçîrvanên serbikulav. Bi wî rengî, heta ku diwesitîyan, bo xo yarî dikirin. Carina jî wan xo dikire koşkên paşa yên bilind, yan jî dibûn hirçên spî û mezin û di xew re diçûn. Ez bi qasî hefteyekê di nav ewran de Mam. Paşî bayek xeyidî û bi hêz hat û em birîn û heta çend rojan em gehandîne vê derê. Evca em ketîne nav ewrên sar û bûyine befir. Noke tu dibînî ku ez jî wek te bûme patolebefir û vedigerime erdî.
Patola dilxoş got:
Bi rastî çîroka te gelek xoş bû. Lê pêwîst nake ku em av, xemê ji bo wan deverên em jê hatîn bixwîn, çinku hemû erd cihê me ye. Em her çend bibin hilim û ewrên asmanî, dê rojek êt ku em bibîn befir û baran û bikevîn erdî. Lewre min jî divê çîroka xo ji te re bêjim. Rojekê refeke (bireke) werdeka ji asmanî hatin û dadane rex derîyaya ku ez tê de dijîm. Werdekan serên xo di avê de dadikirin û bi niklan, kurî û çengên xo paqij dikirin û hindeka jî Melevanî dikir û ji xoşyê diqîjandin. Min guh li du werdekan bû, dema bi hev re dipeyvîn, yekê ji ya dî re digot:
Tu dizanî ku ji asmanî, rengê derîyayê kesike, lê dema tu nêzîkatyê lê dikî, ew şîn dibe.

Heta wê demê jî min nedizanî ku ji asmanî, rengê derîyayê kesike, lewre min jî birîyar da ku digel wan werdeka bifirim û biçim asmanî. Ji ber hindê min xo kire dinav perên nermên bin kurîya werdekekêre. Piştî bîstekê, werdek ber bi asmanî ve firîn. Min di nav perên werdekê re, temaşayî hemû daristanên kesk dikir, paşî min dît ku rengê derîyayê çi qasî kesk û ciwane. Werdekan li wê bilindahîya asmanî, stiran digotin û diqîjandin. Hîngê tava rojê ya zer û germ hat û ez di bin kurîya werdekê re dîtim û kirme hilim. Îcar ez jî têkelî ewrên sarên asmanê vê derê bûm. Heta vê êvarê, ez jî dinav ewrên we yên germ da bûme befir.
Patolebefira xemgîn ji patolebefira dilxoş re got:

Oy... Pa te serpêhatîyeka xoş vegêra! Heta noke, ez qet neketîme nav perên nerm yên bin kuryên werdakan. Xûyaye gelek nerm û xoşin. Êdî ez jî dixwazim wek te dilxoş û bêxem bim. Lê ew ronahîya lampên ku em nêzîkyê lê dikîn, yên kîjan bajarî ne.?
Patolebefira dilxoş got:
Ew bajarê stokholmê ye, paytextê welatê swêdê ye. Bajarekî xuşkoke û xelkê welatê te jî lê dijîn.
Patolebefira dî, bi dilxoşî got:
Oy çend baş e. Ku wisa be, berî em ji hev veqetîn, tu dikarî zarokeke kurd nîşanî min bidî.
Patola dilxoş got:
Belê ez dikarim. Destê min baş bigire, da em biçîn.
Herdu patolên befirê bi destên hevdu girt û dinav patolên dî re derbaz bûn û xo nêzîkî pencereya malekê kir, li ber pencereyê kiçeka biçûk rawesitîyabû.
Patolebefira dilxoş got:
Hevala min, ev kiçikeka kurd e, tu dikarî biçî ye def wê. Ez hêvîdarim ku em carek dî hevdu bibînîn.
Patolebefira dî ew bi germî himbêz kir û got:
Gelek supas ku te alîkarî kir û dilê min xoş kir, xudê digel te be.
Ta ku patolebefira dilxoş dinav patolebefirên dî re berze bû, her destê xo ji hevala xo re bilind dikir û xatir jê dixast. Patolebefira dî jî bi dilxoşî ber bi pencereya ku kiçik li ber rawesitîyabû firî. Navê wê kiçika ku li ber pencereya jora xo rawesitîyayî, ketan bû. Ketan şeş salî bû û dişîya heta sedê bijimêre. Ji lewre jî ketan bi jimartina patolên befirê ve, yên ku di ber pencereyê re diçûn mijûl bû.
Yek patola befirê, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh...
Berî ku ketan jimara dî bibêje. Patola befirê xo di şûşa pencereyê werikir û got:
Deh.
Ketanê got:
Wey ji vê, tu çawa dikarî bi kurdî bibêjê: Deh?
Patola befirê got:
Oy... Çi nema bû şûşa pencereyê serê min bişkêne. Belê; ez bi kurdî dizanim baxivim, çinku ez ji Kurdistanê têm.

Tu heta çendê dizanî bijimêrî?
Heta ku ez av bûm, min dikarî ta sed masîyan di rûbarî de bijimêrim, noke ku ez bûme patola befirê, dikarim xo, patolebefira hevala xo û te jî bijimêrim, ku dibine sed û sê.
Ketan şerpeze bû û got:
Ez tênagehim, kîjan patola hevala te!
Patola befirê got:

Tu dikarî biçî ser nivînên xo û binivî, ta ku ez hemû çîroka xo û ya patolebefira hevala xo jî ji te re vegêrim û da ku tu jî di ber re di xew biçî.
Ketan çû ser nivînên xo. Patola befirê jî dest bi vegêrana çîroka xo û hevala xo kir, ta ku wê gava li ber pencereyê xo nîşanî ketanê dayî. Bi wî rengî, ketan li ber wê çîrokê di xew re çû û patola befirê jî li ser rexê pencereyê nivîst.

* Patole = pîk = kulî = perpûr = kilo: Befireka pan û teneke,
wek goka pembî ye, erdî nagire û zû dihele.